



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

## Tîrêjên Çarşembê


**Xelek - 46**

### Şopên Hûriyan di Kelepora Rojhilata Navîn da (beşê sêhem)

Emê li jêr, li ser bandora zimanê hûrî û çekên şer yên Hûriyan rawestin.

#### Yekem - zimanê hûrî:

Lêkolîner Wilhelm Gernot dibêje: Zimanê hûrî di navbera sedsala 17-an b.z. da li herêmên nawenda Sûriyayê belav bû, û gihîşt heya bi Qetna û Qadêş jî. Helbet, ev vedigere ser belavbûna Hûriyan bi awayekî berfireh di heyama xuyabûna padîşahiya Mîttanî da<sup>1</sup>. Divêt bête zanîn ku Qetna û Qadêş li nêziya bajarê Humsê yê Sûriyayê ne.



(Padîşahiya Mîttanî - li Qetna û Qadêş û Ûgarêt binêre)

Di hin jêderan da, ji zimanê hûrî ra "*Zimanê Xar*", carina jî "*Zimanê Kar*" hatiye gotin. Lêkolînerê Rûs Velikovski derbarê zimanê bajarê Ûgarêt (*Ras Şemra*) gotiye: "**Ew zimanê çarem bû û bi tîpên mîxî di pirtûkxaneya tabloyên Ras-Şemra da jêra gotine "*Xar*", .... wisa tê xuyakirin ku ew di bajêr da zimanê serwer bûye û zimanê dîwanên fermî û yê piraniya rûniştivanên wî bûye**"<sup>2</sup>.

Velikovskî bi ser da dibêje: "**Pêş kolandinên arkêologî li *Ras-Şemra*, pir caran derbarê zimanekî bi navê "*xûr*" agahdarî hebûn ku di gelek belgeyên arkêologî û dîrokî da**

derbas dibû. Hin jêderên akkadî jî derbarê zimanê "xûrî" axivîne û di belgeyên misirî da pir caran ji beşekî Sûriyayê ra "Xarû" gotine. Demeka dirêj ew bawerî bi giştî hebû ku nîşankirina bi wî zimaî li ba Aşûrî û Misirîyan mebest jê zimanê Hûriyan bû"<sup>3</sup>.


Valikovskî dîsa dibêje: "Di belgeyên tomakirî da li *Bogaz-Koy* (*Xatûşa*, paytextê Hittîtan) li Anatoliyayê hin tabloyên dîsa bi wî zimanê biyanî hatin dîtîn. Li wir jêra "kûrî" gotine û ew gelê ku bi wî zimanî diaxivî jêra gelê "Xûr" gotine. Lêkolîner û zanyaran ev nav bi şewazên cuda xwandine. Ji ziman ra peyva "xar" û hin caran jî "xûrş" bi karanîne. Li dawiyê li ser navê "xûr" rawestiyane wek navê ku bêhtir ji wî zimanî ra tê pejirandin; û ji gelê ku bi wî zimanî diaxive ra navê "Hûrî" gotine"<sup>4</sup>.

Valikovskî dîsa gotiye: "Her carê ku tiştekî nû dihate vedîtin, wisa xuya dikir ku zimanê Hûriyan bandoreka xwe ya mezin hebû, û kelîj û beşdarbûna wî di şaristaniya Rojhilata Nêzîk ya kevin da bi hêz bû. Heya ku hate gotin: Gihîştina Hûriyan bo wî beşê cîhanê bû destpêka Elend û berbangeka şaristanî nû. Bi gotineka din, ew bûn hêzeka rêveber. Çîroka belavbûna wan ya bi lez û berfireh ji Ermîniya da heya başûrê Filestîne û ji kenarên Derya Sipî da heya welatê Fars ji dem û werzên here balkêş di dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da ye"<sup>5</sup>.

## Duwem - çek û nawelên şer:

**1 - Duristkirina erebeya şer:** Abraham Malamet û Hayim Tadmor dibêjin: Pêş nêveka hezarsala duwem b.z. belavbûna rûniştivanên hûrî li bakurê erdê Ken'an (Filestîna û Îsraîl) pir zêde bû, û wan bi saya serkeftina xwe ya teknîkî û leşkerî, li pir paytextên padîşahî serdarî bi dest xwe va anîn û di rêza yekem da ji ber wê yekê bû ku wan leşker li erebeyên şer siwar dikirin<sup>6</sup>.

Lêkolîner William Langer dibêje: "Karê herî giranbiha ku Hûriyan kiriye - bi gotineka hên rasttir - ya ku rêveberên wan yê Hindo-Ariyanî kirine ewe ku erebeya bi du dolaban ku bi hespan tê kişandin gihandine Misirê û rojavayê Asiyayê. Ev erebe piştî sala 1600 b.z. êdî naskirî bû û lêkolîneran di nivîsên *Bogaz-Koy* (*Xatûşa*) da pirtûkek dîtine ku ji aliyê kesekî hûrî naskirî va bi navê "Kikkulî" hatiye nivîsandin. Di pirtûkê da gelek peyvên hunerî hindî (sansekritî) hene"<sup>7</sup>.



(Erebeya hûrî ya şer - li wêneyê rojê binêre)

Dr. Abdulhamid Zayed dibêje: "Kolandinên *Bogaz-Koy* agahdarî bi hin daxuyanîyan dane me, ku li ser tabloyên ji hêriyê hatine nivîsandin, têda şewazê perwerdekirina hespan û

**hînkirina wan bi hemû şewazên bazdanê, li gor pirtûka *Kikkuliyê mîttanî*, bi zimanekî nêzî sansekrîtî ye ku berê zimanê xelkê bakurê Hindistanê bû. Zanyaran ji vê yekê encam girtine ku ev kesên ariyanî, dema ber bi rojavayê da hatine, şewazê perwerdekirina hespan çawa erebeyan bikişînin xistine kar û tevgerên şer**"<sup>8</sup>. Hêjayî gotinê ye ku *Sansekrît (Sanskrit)* zimanê Ariyanên kevine yê ku nîvê bakur ji Hindistanê dagîr kiribûn. Ev ziman bi xwe li nêzî zimanên ariyanî rojavayî ye (li Afganistan, Kurdistan û Fars).

Abdulhamid Zayed bi ser va derbarê malbata padîşahî di heyama emperatoriya Hittî da (1380 - 1190) dibêje: "**Wisa hate dîtin ku şewazê malbatê bûye hûrî, bandora şaristaniya hûrî pir li ser hebûye. Leşkerê emperatoriye ku bi çeka erebeyên şer li pêş yê din bû, kesekî hûrî bi perwerdekirina wan rabûye, navê wî (*Kikkuli*) ye**"<sup>9</sup>.

**2 - Duristkirina mectenîqê:** Di dorpêçkirina kelahan da Hûriyan nawelek bi navê *Yaşîbû (Yashibu)* bi karanîne; ew jî mectenîqê<sup>10</sup>. Di hin şîroveyan qur'anê da derbarê sotandina pêximber *Îbrahîm* di dema padîşah *Nemrûd* da tê gotin, ku kesê sezayê *Îbrahîm* bo sotandinê pêşniyaz kiriye, mirovekî Kurd bûye. Di hin gotûbêjên din da hatiye ku agirê pêxistibûn pir mezin û guş bû, û ne gengaz bû ku tikes nêzî wî bibe daku *Îbrahîm* bavêjin nav. Kesekî pêşniyaz kiriye ku bi mectenîqê wî bavêjin nava agir, û ew kes jî dîsa mirovekî Kurd bûye<sup>11</sup>.

Di şîroveya Ibin Kesîr "تفسير ابن كثير" da ev tişt hatiye: "**Paşê Îbrahîm Eleyhî Sellam xistin pença mectenîqa ku kesekî Kurd bi navê *Hîzun* durist kiribû**"<sup>12</sup>. Di şîroveya Abo Siûd "تفسير أبو السعود" da ev tist hatiye: "**Nizanîn çawa Eleyhî Selam bavêjin nava agir, Îblîs hat û ew hînî mectenîqê kirin û ew durist kirin, û gotin ku kesekî ji Kurdan ji wan ra durist kiriye**"<sup>13</sup>.



(Ji wêneyên mectenîqê yê dema kevin)

Li ser navê ew kesê Kurd cudahî heye. Ew (*Hîzir, Hîzun, Hîyûn*)-e, bêyî ku bêjin ew çawa tê bilêvkirin. Ibin Kesîr ew bi awayê (*Hîzun*) gotiye. Me berê di pirtûka "*Wêneyê Kurd di bermaya îslamî da*" gotibû ku ewên ev gotûbêj belav dikirin, arezû û mebesta wan çepelkirina wêneyê Kurd bû. Lê belê wan bi van tewrên xwe em bi du agahdariyên girîng dewlemend kirine:

Agahdariya yekem: Ku Kurd miletekî xwedî dîrokeka kevine û ew bi vî navî hên pêş sê hezar sal naskirî bû. Ji ber ku çîroka pêximber *Îbrahîm* di sedsala 19-an b.z. da pêkhatiye. Malbata wî ji bajarê *Ĥerânê (Haran = Hûran)*, li nêziya *Ûrfayê* bû, li bakurê Kurdistanê. Ew di erdnîgariya hûrî da ye.

Agahdariya duwem: Ku Hûrî bi duristkirina mectenîqê şehreza bûne. Ew gelê ku serboriya wî bi duristkirina mectenîqê û bi karanîna wê hebe, bê guman ew, li gor pîvanên wê demê, xwediyê zanîn û teknologiyeka leşkerî pêşketî bûye.

Di rastiyê da kelepura hûrî gencîneyeka dîrokî pir girînge. Dema ku ev girên Kurdistanê di demên pêş da biaxivin, ewê dîroka Hûriyan ji me ra bêjin. Wê bê xuyakirin ku neviyên wan yên Kurd hên jî di erdnîgariya pêşiyên xwe da rûniştine û hên jî pir tişt ji kelepura Hûriyan di xwe da parastine.

Çarşemb, 10.02.2016

## Jêder

---

<sup>1</sup> Wilhem Gernot, Hûrî, rûpel 49.

<sup>2</sup> Valikovski, heyamên tevliheviyê, rûpel 218-219

<sup>3</sup> Valikovski, heyamên tevliheviyê, rûpel 218 ji Olmtead, History of Palestine and Syria.P. 140.

<sup>4</sup> Valikovski, heyamên tevliheviyê, rûpel 219 û li E.A. Speiser, mesopotamian Origins, p. 133 binêre.

<sup>5</sup> Valikovski, heyamên tevliheviyê, rûpel 219-220.

<sup>6</sup> Abraham Malmat, Hayim Tadmor: Îbranî û Beno Israîl, rûpel 72-73.

<sup>7</sup> William Langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/62.

<sup>8</sup> Abdulhamid Zayed: Ro'jhilata hemdem, rûpel 528.

<sup>9</sup> Abdulhamid Zayed: Ro'jhilata hemdem, rûpel 473.

<sup>10</sup> Adnan Al Hadidi, Muawiye Ibrahim: Dîroka rojhilata nêzîk ya kevin, rûpel 346.

<sup>11</sup> Al Tabari: Came' Al Beyan, 10/43. Al Qurtubi: Al Came' li Ehkam Al Qur'ân, 11/200. Ibin Hayan: Tefsir Al Behir Al Muhit, 6/328

<sup>12</sup> Ibin Kesir: Tefsir Al Qur'an Al Ezim, 3/183-184.

<sup>13</sup> Abo Al Suûd: Tefsir Irshad Al Eqil Al Selim, 6/76.